# AGAHÎYÊN BİNGEHÎ Jİ BO XEBATÊ Lİ YEWNANÎSTAN



© UNHCR/ Victor Augusto Sánchez Mejía

UNHCR
The UN Refugee Agency

In partnership with:

CARITAS HELLAS

CRS CATHOLIC RELIEF SERVICES

ΔΗΜΟΣ ΙΩΑΝΝΙΤΩΝ

Αναπτυξιακή Ηρακλείου HERAKLION DEVELOPMENT AGENCY

INTERNATIONAL RESCUE COMMITTEE

INTERSOS HELLAS

METAdrasi

STEPPING STONE

SOLIDARITY NOW This is our common ground

## KÎ

Heke hûn penaberê naskirîyî, mafdarê parastina însanî yan jî mafdarê parastina demkî, mafê te ji bo xebatê fermî heye û dikari çalakîyê aborîya serbixwe (xebatê bi xwe, avakirina şirîke/şîrket) pêk bîne. Heke tu daxwazkarê penaberîye, şêst (60) roj dawîyê ji roja tomarkirina serîlêdana penaberîyê gihiştina xebatê yasayî heye.

## ÇI PÊWİSTE KU TU XEBAT BIKI

**Ji xebat kirina te di Yewnanîstanê, tû hewce ye:**

- Destûra rûniştinê –zha Bo penareban naskirî, mafdarên parastina însanî (ΑΔΕΤ) û mafdarên parastina demkî – yen zh daxwaz karên penaberîyê ku qertên wan derbasdar e.
  **Zha kerema xwe bala xwe bidin** ku Zha Bo ku tû bi yasayî bixebiti, destûra rûniştinê/qertê daxwazkarê paneberî derbasdar be. Ji ber vê yekê, nûve kirina wî ji bîr nekin.
- Hejmara Qeyda Bacê (ΑΦΜ).
- Hejmara Qeydê Ewlekarîya Civakî (AMKA) – zha Bo penareban naskirî, mafdarên parastina însanî (ΑΔΕΤ) û mafdarên parastina demkî – yan Hejmara Ewlakarîya Demkî û Tedawîya Tendûristîya Biyanî (PAAYPA) ji Bo daxwazkarên penaberî.
- Hejmara Qeydê Sîgortekirî (AMA) ji hêla Sazîya Ewlekarîya Civakî ya Neteweyî (ΕΦΚΑ) tê derxistin piştî ku xebatekî te bê peşnîyar Kirin.

## MAFÊN KEDKARAN

La gorî qanûnên Yewnanîstanê, tû wek hemwelatiyên Yewnanî xwedî hemî mafên kar û sîgorteyê ne, di nav de meaşê bingehîn, mûçeyên malbatê, demjimêrên/saetên xebatê, dema zêde, betlanê, qezayên xebatê, dayiktî/dayikbûnê, nexweşî, bêkarî û teqawidbûn heye.

## ŞERTÊN XEBATÊ

Heger tu bi kar bûyî, kardêr / xwedîyê kar mecbûr e ku bi nivîskî şert û mercên peymana kar ji te re agahdar bike. Ev peyman bi şiklê "agahdariya kargêriyê" ji rayedaran/merci re tê ragihandin. Her daîm kopiyek ji peymanê bipirse. Bi îmzekirina "agahdariya kargêriyê", hem karmend/ xebatkar û hem jî kardêr girêdayî ya bi şertên lihevkirî ne. Di vê belgeyê de agahdariya li ser celebê/şiklê xebatê we, dema xebata heftane, dirêjahiya xebat, demjimêrên xebat, meaş û cîhê xebatê heye.

## /MÛÇE YAN MWCHA / MEAŞ (ZHA /JI MAHE NÎSANÊ 2025)

Zha bo karkirina/xebatê tev-demjimêr, ger tu ne zewicî bi û tekîldarîya te bi xebatê tûne bi mûçeya mehane ya hindiktirîn li Yewnanîstanê 880 euro ye (brut).
Ger tû bi rojane dixebitî, ne zewicî bi û tekîldarîya te bi xebatê tûne bi herî kêm 39,3 euro ye (brut).
Mûçeya zelal (mûçe ya ku tu distînî) girêdayî ya bi bacên girtina, teqawid, sîgorteya tenduristîye û hwd. Her weha mafê te ji bo alîkarî/mûçe ya Noel, Paskalya û havînê heye, ku mîqdara wan bi mûçaya mehanê/rojane û dirêjahiya xebatê te li cem kardêr ve girêdayî ye.

## MESAÎ/ XEBATA ZÊDETIR

Saetên xebatê heftane 40 saet in ji bo xebata 5 rojan (8 demjimêr/roj) – bi gelemperî ji roja Duşemê heta roja Înê ye. Gelek şerîket 24/7 dixebitin, ku tê fehmkirin ku 2-3 wardiye/nobet bi 8 demjimêran hene. Kesên ku hefteyê 6 rojan dixebitin, saetên xebatê 6 saet û 40 hûrdem-deqîqe/roj in. Mesaî ên heta 1 saet di rojê de û 5 saet di hefteyê de, ji bo 5 rojan xebat di hefteyê de, û her roj 1 saet 20 hûrdem û heftayek 8 saet ji bo hefteyek 6 roj dixebitin. Mesaî yanî xebata zêdetir li gorî mûçeya rojane zêdeyî 20% tê dayîn. Ji bo xebatên rojê zêdetir 9 saetan rojanî, tezmînatê taybetî hene.
Xebatê şevê: Ji saet 22:00 heta 06:00: Tezmînata demjimêr ji bo her saetên şevê, zêdetir 25% e.
Ger roja Şemîyê an ji bo roja 6an a hefteyê bixebitin: Mûçeya rojane ya diyarkirî/sabît û zêdetir 30% e.

---

## DESTUR / ÎZİN

**Destura salane:** Ji bo sala yekem xebatê tam-demê, mafê te heye ku her mehê du rojên betlane (heta 20 rojên betlanê/ji bo 5 rojên xebat û 24 rojên betlane/ji bo 6 rojên xebat ji bo yekem salê xebatê, bi eynî 21 û 25 roj ji bo sala duyemîn, 22 û 26 roj ji bo sala sêyemîn û pê ve).
**Destura Nexweşiyê:** Dema ku tu ji ber nexweşiyê ji kar derdikevi û bi şertê ku tu hemî belgeyên bijîjkî/doqtor yên têkildar radest biki, piştî 10 rojên kar mafê te heye ku heya 15 rojan mûçeya rojane bistîni. Piştî salek xebatê, mafê we mûçeyek mehane heye.

---

## GEŞTYARÎ Û SEKTORÊN TAYBETÎ JI BO XEBAT

Carinan ji bo xebatên taybetî destûrek taybetî an jî belgeyên zêde pêwist dibe. Mînakî, ger tu dixwazi bixebite dikanekî bi standardên tenduristîyê bicîh bîne, wek xwaringeh, kafê, hwd. Divê tu belgeya tenduristiyê û desturnameyek taybetî ji bo xebatê ji hêla Beşa Polîsê derxin. Di sektora geştyarî de, şertên xebat û hemî destûr dibe ku cûda bibin.

---

## NEÇARÎTÎ Û ŞÎRET/ TEWSİYE

- Heger tu nexweş bî yan jî tiştekî neasayî hat serê te, divê tu di zûtirîn dem de kardêrê xwe agahdar bikî.
  - ⇛ **Hişyarî:** Heger tu bê sedemekî girîng ji kar derkevi, ew dikare bifikire ku tu ji karê destberdaye û prosedurên/muameleyên pêwist destpêbike.
  - ⇛ Ger tu dixwazi ji karê berdi/îstifa biki, kardêrê xwe agahî bidin ku ew jî ji alîyê xwe prosedurên guncaw bişopîne.
- Her roj biçe ser karê xwe.
- Her roj di wextê xwe da li ser karê xwe bibe
- Ger pêwist bi tu zû ji karê xwe derkevi, çavdêrê xwe agahdar bike û destûra wî bixwaze.

## RAWESTANDİNA XEBAT

Mafên ku tu heye ji bo rawestandina xebatê girêdayîya şiklê peymana xebatê te ye. Ger peymanek demkî ya te hebi (peymana dem-sînorkirî), bi gelemperî ji bo kardêrê zehmete ku te derêxi berê tewawbûna peymanê. Ger peymanek vekirî/bê-sînorkirî te hebi, kardêr her daîm dikare te derêxî ji karê. Lê belê, heger tu di nav salekî bi kardêrê eynî bixebitî, mafê te heye ku tu tezmînatê xwe bistînî. Mîqtarê tezmînatê tam, girêdayî ye bi çend salan ku tu dixebitîye Bi wê kardêrê ye.

## XEBATÊ BÊYASAYÎ

Ger kardêrê te gûhnadi bi prosedurên yasayî û heremî (bi ragihandina "agahdariya kargêriyê" te ji bo rayedaran):

- Mafê te yê sîgorteya tenduristî û ewlahiya civakî nîne.
- Xeterî/Metirsi heye ku ji te ra mûçeyê te nedi an jî mûçeyêkî kêmtir ku hûn berê lihevkirîbî ji tere bide.
- Tu nikari ji bo tezmînata bêkarî/betalî ye an jî ji bo alîkarîya aborîyê serlêdanê biki ku bi normalî mafê te heye.

## BINPÊKİRİNA MAFAN

Ger pirsên te di derbarê mafên te yên xebatê hebi an jî dixwazi dijî kardêrê xwe gilî bikin ji ber ku ew binpêkirina mafên te yê xebatê dike, pêwiste ku tu biçi serdana li Daîreya Teftîşa Kar li Yewnanîstanê nêziktir (https://www.hli.gov.gr/) an jî ji bo hejmara 1555 telefon bikin.

# XEBATÊ XWE YA NÛ BİBÎNİN>

SCAN

SCAN

Ev platforma bêpere/bêdirav, penaberên ku li Yewnanîstanê kar digerin girêdide bi kardêrên li hemî welat e.

## TOMAR BİKİN Jİ BO XEBATÊN HERÎ DAWÎ

https://adamajobcenter.crs.org




© UNHCR/Ruben Salgado Escudero